Gîyanewerê agir berdaye xo

Wergirtin ji fuliklorê kurdî
Nazidar Mihemed

Rojekê ji rojên biharê, şivanekî wekî hemî rojên dî pezê xo dibete çolê. Wê rojê gelek birisî dibît, ew jî radibît pezekê bo xo vedikujît da bixot. Hêrive û wêve diçît şkeftekê dibînît, diçîte têve û agirekî bo xo heldket.

Ji nişkekêve sehdketê gîyanewerekê mezin û bi pwîrt hate bi rex wêve rwînişt.

Şivan sehdketê ka ew çi diket, ew gîyanewer jî yê wê diket.. Şivan da rwînît ew jî dirwînişt, şivan radibû ew jî radibû, şivanî serê xo dixurand wî jî serê xo dixurand.

Şivan mendehoş bû û di hizra werbû. Piştî bêhnekê ew çwîvê biçwîkê di destê xo da kire di nav agirî ra û mwyên reşên leşê xo pê kuzirandin.. Dema wî gîyanewerî ew şivan dîtî wekirî ewî jî wekî wî kir û agir berda xo û agir vêrra çû.. Hindî şivan hat û çû da harîkarîya wî biket, belê wî gîyanewerî xo lê negirt û di nihalekê da kefit û mir.

Zarokên hêja..

Divêt em hemî di hişîyar bîn ji zarivekirina korikorane; çunkî dwîmahîya wê peşêmanî .û têçûne